Hilbijartina Şaredariyê ya 22. Îlon 2024-an – Bernameya Keskên Ostermundigen

Namzetên me yên Meclisa Şaredariya Mezin (Grosser Gemeinderat) û Meclisa Şaredariyê (Gemeinderat) bi dirûşmên "ekolojîk - hevgirtinî - beşdarvanî" cihê xwe digirin.

Ekolojîk:
Piştî pejirandina pêşniyarnameya me ya bi sernavê "Parastina avûhewayê wekî mijarek navdîsîplînî"[1], li gorî pêşniyara me ya ku heya sala 2028-an etîketa "Bajarê Enerjiya Zêrîn"[2] dixwaze, ji bo parastina avûhewa û pircûreyîya biyolojîk pêdivî bi tedbîrên berbiçav heye.
Di guhestina bi giştî de em naxazin bi tenê bi guherîna benzînê bi elektrîkê werin ser, di heman demê de, em dixwazin hatûçûna peyayan û bisîklêtan û veguheztina giştî balkêştir bikin û avantajên wan derxin pêş. Weke mînak, ji bo teşwîqkirinê em dixwazin bi dirêjahiya salekê piştgiriya kirîna Libero-Abonman[3] / GA[4] / bisiklêtan, bidin ciwanan. Em dixwazin girêdanên veguhestina giştî yên ji bilî Xeta 10-an berfireh bikin. Ji bo kêmkirina hatûçûnê, em ê piştgiriya herêmên aborî yên xwecihî bikin û em ê li hember berfirehkirina otorêyên derdora Bernê derkevin[5]. Di encamê de wê veguhestin bi tenê weke dostê jîngehê nemîne, di heman demê de wê zêdetir bi tendurist û bêdeng bibe.

Divê pergalên germkirinê yên bi petrol û gazê bileztir bên guhertin û di avahiyên heyî de jî îzolasyon bê baştirkirin. Di vê pêvajoyê de divê kirê ji kêmbûnên lêçûnên ji derî kirê zêdetir bilind nebin. Pêwîste materyalên avahîsaziyê heya pêkan be li cihên guncaw jinûve bên bikaranîn.

Li hember qadên germ, divê dar û qadên kesk bên zêdekirin û deverên qîrkirî bên kêmkirin. Herêmên bê avadanî yên weke Rörswil[6] divê bên parastin û bi awayekî ku ji bo wesfa axê û pircûreyîya biyolojîk bikêrdar bê birêvebirin.

Hevgirtinî:
Ji bo di asta şaredariyê de, em pêşî li lêçûnên jiyanê yên bilind dibin bigirin, weke di Projeya Veguherîna Tram de[7], em dixwazin bi daxistinên kirêyan[8] piştgiriya xaniyên ne bi mebesta karê ne bikin.
Xizmetguzariyên civakî yên heyî, weke bernameya perwerdehiya destpêkê ya gavbigav schritt:weise[9], divê bêyî lîsteyên libendemayînê, xwegihandina wan bê pêkankirin û divê nêzîkatiyên bi nirx yên di Rênîşa Civaka Ostermundigen[10] de bi lez derbasî jiyanê bên kirin. Em bi taybetî di demên betlaneyê de daxwaza xizmetguzariyên lênêrîna zarokan û piştgiriya tenduristiyê û di mijarên weke fêrbûna zimanê Almanî de daxwaza kûponên perwerdehiyê dikin.
Xebatkarên şaredariya Ostermundigen, weke di hemberîhevkirinên bi xebatkarên şaredariyê din de tê nîşandan, pir berhemdar dixebitin – di vî warî de sexbêrî wê xelet be. Wekî din, Ostermundigen divê

[1] https://www.ostermundigen.ch/wAssets/docs/politik-verwaltung/politik/grosser-gemeinderat/archiv/2020/september/T327_upMotion.pdf
[2] https://www.energiestadt.ch/de/energiestadt/energiestadt-werden/energiestadt-gold-werden-132.html
[3] https://www.mylibero.ch/de/abos
[4] https://www.sbb.ch/de/billette-angebote/abos/ga.html
[5] https://spurwechsel-bern.ch/uebersicht-ausbauprojekte/
[6] https://s.geo.admin.ch/z0k7sk0k43bx
[7] https://tram-bern-ostermundigen.ch/das-projekt/haltestellen/endhaltestelleoberfeld/
[8] https://www.bwo.admin.ch/bwo/de/home/wohnraumfoerderung/baurechte.html
[9] https://www.ostermundigen.ch/de/verwaltung/dienstleistungen/159_programm-schritt:weise
[10] https://www.ostermundigen.ch/de/aktuelles-projekte/aktuelles/meldungen/LeitbildGesellschaft.php

di peydakirina mal û xizmetguzariyan de pîvanên ekolojîk û şert û mercên xebatê yên li gorî rûmeta mirovan li ber çavan bigire.

Beşdarvanî:
Her kesekî li Ostermundigen dijî divê dikaribe bi pêşniyarnameyeke weke modela Bernê beşdarî vê derê bibe[11].
Li Ostermundigen pêdivî zêdetir bi xalên hevdîtinê yên bê neçariya lêçûna zêdetir heye, mînak, weke Navenda Çandê ya Tell a xwebixwe xwe birêve dibe an weke salonên sporê yên ji bo xwendekaran vekirî. Mînak, em ji bo qadên weke tekstîl û darî, jûrên bi piştgirî yên nîvdemî û atolyeyan pêşniyar dikin. Ji bo piştgirîkirina projeyên xwebexşan me pêşniyarnameyeke budçeyeke[12] beşdarker pêşkeş kir. Weke qadên fermî, divê herkes dikaribe xwe bigihîne van xizmetguzariyan, mînak, bikarhênerên erebokên astengdaran, astengdarên dîtinê dê û bav û bi taybetî dayîkên xwedî zarok biçûk.

Şîrove yan pirsên we hene? Hûn dikarin bi rêya standa Keskan a di 31ê Tebaxê roja şemiyê li Mundige Feschtê[13] an jî bi rêya navnîşana info@gruene-ostermundigen.ch bi me re têkevin têkiliyê.

Ev nivîs ji zimanê almanî tê wergirtin. Mixabîn em bi kurdî fêm nakin (hîn).

Namzetên me

Namzetên sereke	
	Adrian Tanner 1987, MA Wergêrîna Konferansê FTI Genêv, Wergêr Meclisa Şaredariya Mezin (Grosser Gemeinderat): endam Meclisa Şaredariyê (Gemeinderat): namzêd
	Kathrin Ernst 1991, Serokê Projeyên Transportê, BSc EPFL Elektrîkî Meclisa Şaredariya Mezin (Grosser Gemeinderat): endam Meclisa Şaredariyê (Gemeinderat): namzêd

[11] https://www.bern.ch/themen/stadt-recht-und-politik/mitreden-und-mitgestalten/partizipationsmotion
[12] https://www.ostermundigen.ch/wAssets/docs/politik-verwaltung/politik/grosser-gemeinderat/archiv/2024/September/T295.0_MotionBudget.pdf
[13] https://www.mundige-fescht.ch/

	Samuel A.J. Augustiny 1989, MSc Mekanîk, Serokê Projeya Inşaatê, bêparti Meclisa Şaredariya Mezin (Grosser Gemeinderat): namzêd
	Christian Burr 1974, Mamoste ya li BFH, Pisporê tenduristiyê û Zanistvan, Dr. rer. cur. Meclisa Şaredariya Mezin (Grosser Gemeinderat): namzêd
Namzetên din	
	Natascha Neumeister 1968, Doktor, Dr. med.
	Emanuel Indermühle 1980, Pisporê Informatîkê, Dr. phil. nat., Mîmarê Software
	Folco Giacomini 1973, Geolog, Dr. rer. nat., Bêpartî
	Thomas Feider 1990, Mîmar, ETH

Werger: Çelebi Yavuz